

Belgeya ragehandinê

Ji bo vaksînekirina li dijî COVID-19 (Vîrûsa Korona 2019)

- Bi vaksîna hilgir – (Vaxzevria®, berê vaksîna AstraZeneca COVID-19 ji AstraZeneca û vaksîna Janssen® COVID-19 ji Johnson & Johnson)

Ji 1-ê Nîsana 2021-an (Ev belgeya agahdariyê bi domdarî tê nûve kirin)

Navê kesa/ê ku tê vaksîne kirin (Ji kerema xwe bi tîpên mezin binivîse):
Rojbûn:

COVID-19 çî ye?

Vîrûsa Korona bi dehsalan têne zanîn. Ji dema guhertina sala 2019/2020 ve, korona vîrûsek nû, Korona vîrûsa Sendroma giraian tenefûsî-2 (SARS-CoV-2), li seranserê cîhanê belav dibe, ku ew patojina COVID-19 (Vîrûsa Korona 2019) ye.

Nîşaneyên berbiçavê yê COVID-19 pêk tên ji kuxika hişk, ta, bêhna tengî, û her weha windabûna bîhn û tamê ya demkî. Hesta nexweşîya giştî ku bi serê û êşa endaman, êşa qirikê, û avrêja pozê ve jî hatiye dîtin. Nexweş kêmtir dibe ku pirsgerêkên xwarin mehandinê, werimîna multehim, û werimîna girêkên lîmfê jî tên ragehandin. Gengaz e ku paşê zirarê bigihîje rehikan an pergala dil-demar û her weha domandina nexweşiyê. Her çend nexweşî bi gelemperî sivik e û piraniya nexweşan bi tevahî baş dibin, lê bûyerên giran ên nexweşiyê, wekî nimûne nexweşîya sihan ku dikare bibe sedema mirinê jî heye.

Ji bilî pêşgirtina li nexweşiyê bi şopandina rêgezên AHA + A + L (parastina dûrbûna civakî, şopandina paqijîya kesane, bikaranîna maskê di jiyana rojane, daxistina sepna hişyariya Korona, hewakîşandina berdewama adeyê), vaksîn parastina herî çêtirê li dijî nexweşiyê radest dike.

Kîjan derzî tê bikar anîn?

Çend vaksînên hatî pejirandî yê COVID-19 hene ku ev qas ku ji bo parastina takekesî li dijî COVID-19 kêrhatî ne û wekî bersîvek ji bo epidemiyê jî kêrhatî ne. Vaksînên hilgirê COVID-19 ku li vir hatine nîqaş kirin, (Vaxzevria® ji AstraZeneca, berê vaksîna AstraZeneca® COVID-19) û vaksîna Janssen® COVID-19 ji Johnson & Johnson) vaksînên ser bingeha genetîkî ne ku hilbirîna wan li ser teknolojiya bilind hatiye pêşdîtin kirin. Vaksînên berê hilgir li dijî nexweşiyên din hatine erê kirin

Ev vîrûsê ku ji vîrûsên bi navê vîrûsên hilgir çê dibin. Ev vaksîn hilgir ku hatine nîqaş kirin tam hatine lêkolînkirin û nikarin xwe dubare bikin, ev vîrûs zindî nînin. Di vîrûsa hilgir de agahdariyên genetîkî ya proteîna vîrûsa korona, ku jê re proteîna oşî tê gotin, hene. Di vîrûsa hilgira COVID-19 de vîrûsên vaksînê ku dikarin dubare bibin, tune ne, ev tê vê wateyê ku kesên vaksîne bûyî nikarin vîrûsên vaksînê ji kesên din re veguhezînin.

Agahdariyên veguhestî ku ji aliyê vîrûsa hilgir piştî vaksîldanê di genoma mirovî de ne tevhev nabe, lê piştî têketinê di şaneyan de (di serî de di şaneyên masûlkeyan de li cihê vaksîldanê û di hin şaneyên parastinê de) "tê xwendin", di encamê de ev şane proteîna oşîya xwe berhev diken. Proteîna oşîya bixwe nikare bibe sedema tûşîbûna ji SARS-CoV-2 ê re. Proteînên oşî yê bi vî rengî ji aliyê laşê kesê

vaksînekirî ve têne hilberandin ji aliyê pergala parastinê ve wekî proteînên biyanî têne zanîn. Wekî encamek, antîbodî û şaneyên parastinê li dijî proteîna oşî ya vîrusê têne hilberandin. Ev rewş bersivê ewleh ya parastinê diafirîne.

Vîrusa hilgir nikare di laşê mirov de zêde bibe û piştî demek kurt têkdîçe. Piştî wê, ti proteîneke vîrusa zêde (proteîna oşiy) nayê hilberandin.

Vaksîn çawa tê lêdayin?

Ev vaksîn di masûlkeya milê jorîn de tê lêdayin. pêdivî ye ku Vaxzevria® ji AstraZeneca du caran were lêdayin. Ji bo ku bi kêrhatî vaxlêdanê were parastin, Komîteya Daîmî ya Immunîsasyonê li Enstîtuya Robert Koch (STIKO) di navbera vaxlêdanên yekem û duyemîn de herî kêrhatî 9 heta 12 hefte zêdetir navberê pêşniya dike. Niha ji bo vaxlêdana duyemîn, pêdivî ye ku vaxlêdana çêkerî ji aliyê heman vaxlêdana yekem de were bikar anîn; veqetandek ji bo kesên di bin 60 saliyê de heye ku Vaxzevria® ji AstraZeneca ji bo vaksîneya yekem ji wan re hatiye bikar anîn. Ji bo kesên wusa, STIKO niha pêşniyar dike ku vaksîneya duyemîn 12 hefte piştî vaksîneya yekem a mRNA (Comirnaty® ji BioNTech / Pfizer an COVID-19 Vaccine Moderna® ji Moderna) pêk were.

Vaksînekirin çiqas bibandor e?

Di zanîna heyî de, her du vaksînen COVID-19 pir bi bandor in: AstraZeneca's Vaxzevria® di hemî komên temenê de heta ku navberê 12-heftî li gorî pêşniyara STIKO, hate dîtin, heta %80 bandor nîşan da û vaksîna Johnson & Johnson's Janssen® COVID-19 hema hema %65 bandor nîşan da. Ev tê vê wateyê ku gengaziya tûşîbûna kesê vaskînebûyî ji COVID-19 heta %80 (bi Vaxzevria® ji AstraZeneca) an nêzîkî %65 (vaksîna Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson) kêmtir ji kesê ku vaksîne nebû ye. Di pêşîgirtina li nexweşiya giran a COVID-19 (ji bo nimûne dermankirina nexweşxaneyê) de bandor hêj zêdetir bû: hema hema %95 bi COVID-19 Vaxzevria® ya AstraZenecabi û nêzîkî %100 bi vaksîna Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson. Ji ber vê yekê, eger kesek bi vê vaksîna COVID-19 vaskîne bibe, bi patogjenek re têkeve têkiliyê, gengaziyek girîng heye ku ew mirov nexweş nekeve. Vêga nediyar e ku ew parastina vaskîne heta kengî berdewam dibe.

Heta eger hûn werin vaksîne kirin jî, pêwste ku hûn rêzikên AHA + A + L bişopînin da ku xwe û hawîrdora xwe biparêzin. Sedem ev e ku parastin yekser piştî derzîlêdanê dest pê nake û ji hemî kesên ku hatine vaksîne kirine wekhev peyda tune ye. Wekî din, ka mirov dikare tevî ku hatibe vaksîne kirin, vîrusa (SARS-CoV-2) belav bike, yan na, hêsta nediyar e.

Kî bi taybetî dikare vaksînek dijî COVID-19 bikar bîne?

Gelek vaksîn li dijî COVID-19 hatine pejirandin û ji bo parastina takekesî ya li dijî COVID-19 û berteka pandemîkê bi heman rengî kêrhatî ne. Her çiqas, ji ber ku ev vaksîn têra hemû kesan nake, ji bo kesên ku metirsiyek mezîn di tûşî tîpa giran an kujerê COVID-19 () de hene pêşîn e an kesên ku ji ber şola xwe zêdetir di bin metirsiya tûşîbûna SARS-CoV-2 de ne yan kesên ku bi kesên ku ji ber karê xwe di bin xetera tûşîbûna COVID-19 de ne re dikevin têkiliyê, , pêdivî ye ku werin vaksîne kirin.

Ji bo kî nabe vaksîne were lêdayin?

Ji ber ku vaksînen hilgirên COVID 19 ji bo zarok û nûciwanên di bin 17 saliyê de nehatine pejirandin, divê ew bi vaksîne hilgirên COVID 19 neyên vaksîne kirin.

STIKO vaksîneya bi AstraZeneca's Vaxzevria® tenê ji bo mirovên 60 salî û mezin re pêşniyar dike. Ji bo mezinên di bin vî temenî de, STIKO niha vaksîneya bi vê vaksîne pêşniyar nake, ji ber ku nexweşiyên giran di hin rewşên kêr de, bi taybet di mirovên di bin 60 salî de çê dibe. Ev nexweşî pêk tên ji meyîna xwînê (tromboz) bi kêmbûna jimara plaketên xwînê (trombosîtopenî) û carinan xwînrijandinê jî di nav de hebû. Hin ji ev kes mirine.

Ji bo kesên 60 sal û mezintir, metirsiya nexweşiya giran a COVID-19 an mirina ji ber COVID-19 bi berçavî ji ciwanan zêdetir e. Wekî din, tevliheviyên li jor hatine vegotin bi giranî di kesên di bin 60 salî de pêk hatine. Ji ber vê yekê, vaksîna bi Vaxzevria® ya AstraZeneca® ji bo mirovên 60 salî û mezintir tê pêşniyar kirin. Hatiye nîşan dayin ku vaksîn di vê koma temenî de jî bi bandor e.

Li gorî pêşniyara STIKO, vaksîna bi AstraZeneca Vaxzevria® eger doktorek biryar bide bo mirovên di bin 60 saliyê de hîn jî gengaz e.

Vaksîneya duyemîn piştî vaksîneya destpêkê bi Vaxzevria® ya AstraZeneca:

Ji bo kesên 60 salî û mezintir ku vaksîneya xweya yekem bi AstraZeneca's Vaxzevria® girtine, têtê pêşniyar kirin ku ew vaksîna xweya duyemîn jî bi AstraZeneca's Vaxzevria® bistînin.

Ji bo kesên di bin 60 saliyê de yê ku berê bi Vaxzevria® AstraZeneca hatine vaksîn kirin, STIKO niha pêşniyar dike ku vaksîna duyemîn 12 hefte piştî vaksîna 1 bi vaksîna mRNA were (Comirnaty® ji BioNTech / Pfizer an vaksîna Moderna® COVID-19) were dayîn.

Kesên tûşî nexweşiyek çalak a bi tayê (38.5° C û jortir), dibe tenê piştî başbûnê werin vaksîne kirin. Lêbelê, sirlêdayin an taya hinekî bilind (bin 38,5 ° C) nabe sedem ku vaksînekirinê dereng bikeve. Kesên ku ji yek ji madeyên pêkhînerê vaksînekirinê re alerjiya giran hene, nabe werin vaksîne kirinê, ji kerema xwe berî ku vaksînekirinê ji pisporê xweya vaksîne re bêjin. Kesa/ê ku piştî vaksînekirina yekem bertekek alerjîka yekser hebe (anafilaksî), nabe vaksîna duyemîn bistîne.

Kesên bêyî kêmasiya parêzbendiyê ku di wan de tûşbûna bi vîrûsa nû ya koronayê hatiye piştrastkirin, nabe zûtir ji 6 mehan paş başbûnê yan piştî pêhesînê bêne vaksîne kirin û dibe ku tenê dozek vaksîne bistînin, hê nayê zanîn ka doza duyemîn ji bo wan kesan pêwîste yan na. Kesên ku piştî vaxlêdana yekem, tûşbûna bi vîrûsek korona ya nû di wan de hatiye teşxîs kirin, dikarin vaxlêdana 2emîn zûtir ji 6 mehan piştî enfeksiyonê li gorî STIKO bistînin. Eger di berê de kesek tûşî vîrûsa korona bibe, tu sedem tune ku vaxlêdan ji bo wî/wê xeternak dibe. Ji ber vê yekê, tu pêdivîyek bijîşkî ji bo qedexa kirina vê berî vaksîneyê tune.

Hêşt tu tecrûbeyê kêrhatî li ser bikaranîna ev vaksînen COVID-19 ya hilgir di maweya ducanîbûn û şîrdanê de tune ye. Niha STIKO di dema ducanîyê de vaksînekirina gelemperî pêşniyar nake – bêy berçavgirtina tîpa vaksîna COVID-19. Di rewşên takekesî de, jinên ducanî yê xwedan sêqeyên nexweşiyê ku di bin metirsiyek mezina tûşbûna tîpa dijwara COVID-19 de ne, dikarin piştî nixandina rîsk û sûd û şewirmendiyek baldar, vaksîne bistînin. STIKO qet texmîn nake ku vaksîneya dayikê di dema şîrdanê de ji bo zarokî bi xeter bibe.

Eger we nexweşiyek aloziya merandina xwînê hebe yan hûn dermanên dijî merîna xwînê dixwînin ji kerema xwe berî vaksîneyê doktorê xwe agahdar bikin. Hûn dikarin bi tedbîrên hêsan vaksîne bibin. Tiştêk tune ku li kesên bi parastina bikêmasî pêşî li vaksîneyê bigire. Lêbelê, vaksîne dikare di nav kesên weha de bi bandor nebe.

Eger alerjîk yan di dema borî de we bertekên alerjî hebin, ji kerema xwe berî ku hûn vaksîne bibin ji doktorê xwe re bêjin. Doktorê we dê ji we re bêje ka sedemek heye ku hûn vaksîne bikin yan nekin.

Berî û paşya vaksînlêdanê divê ez çi bikim?

Eger piştî vaksînekirina berê an vaksînek din hûn ji hiş çûbin an tûşî alerjiyên yekser bibin, ji kerema xwe doktorê ku vaksîn pêk aniye, agadar bikin. Di vê rewşê de, ew dikare piştî vaksînekirinê ji bo demek dirêj we bişopîne.

Pêdivî ye ku di navbera vaksînên din de herî kêm 14 roj derbas bibin.

Piştî ku hûn vaksînekirinê werdigirin hewce nake ku hûn bêhna xwe vedin.

Eger piştî vaksînekirinê êş an taya we hebe (binêrin "Li paş vaksînekirinê engaze li hember vaksînekirinê çi bertek çê bibe?"), dibe ku dermanek aramker/ taybir were bikar anîn. Hûn dikarin li ser vê yekê bi bijîşkê malabata xwe re biaxivin.

Eger piştî vaksîneyê hûn tûşî bêtegî, êşa singî, werimandina lîngan, an êşa zikî ya domdar bûn, rasterast li bijîşkî bigerin.

Eger we piştî vaksîneyê serêşên giran an domdar hebûn an jî çavê we tarî bûn, an jî li derveyî cihê derziyê birînek an reşatiyek hebe, divê hûn bilez ji bijîjkek bigerin,.

Çi cûre bertek piştî vaksînekirinê, çê dibe?

Piştî vaksînekirina bi vaksîna hilgir, dibe ku bertekên demkurt û demkiyê herêmi û gelemperî ku têkiliyên di navbera laş û vaksînê de nîşan didin, çêbibin. Hevdem ev bertek gengaze pêk bên ji tayê, lertzê û nîşanên din ên mîna grîpê. Piştî vaksîne kirinê bi gelemperî di nav çend rojan de kêm dibin. Ji bo kêmkirina nîşanên gengaz dikarin dermanê êşbir/taybir di dozeya pêşniyarkirî de bikar bînin.

Vaxzevria® von AstraZeneca®: Bertekên vaksînê yê herî zêde di lêkolînên erkîrî de, hatine ragihandin pêk tên ji hesasiyeta cihê vaksînê (zêdetir ji %60), êşa cihê vaksînê, westîn, serêş û lertzê (zêdetir ji %50), êşa movik (zêdetir ji %40), zêdebûna tay û lertzê (zêdetir ji %30), Dilrabûn û êşa li dora movikan (zêdetir ji %20). Bi piranî (di navbera %1 û %10) de werimîna girikên lîmfê, kêmbûna meyla xwarinê, sergêjî, xwevovîbûn, zêdebûna xûdanê, xwurîna û pîrîkên çermî çêdibe.

Vaksîna bi Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson: Bertekên vaksînê yê herî zêde di lêkolînên erkîrî de, hatine ragihandin pêk tên ji êşa cihê vaksînê (zêdetir ji %40), serêş, westîn, û êşa masûlkeyan (zêdetir ji %30), dilrabûn (zêdetir ji %10). Bi piranî (di navbera %1 û %10) de tay, kuxîn, eşa movikan, sûrbûn û werimîna cihê derziyê di gel lertzê hatiye ragehandin. Carna (di navbera %1 û %1) de, lertz, bêniştin, êşa qirikê û devî, xwurîna û pîrîkên çermî, zêdebûna xûdanê, eşa masûlkeyan, eşa pêyan, eşa kemerê, hesta sistbûna giştî û sistbûnê, çêdibe.

Di kesên pîr de kêmtir ji kesên ciwan ev bertek derdikevin. Bertekên vaksînlêdanê bi piranî sivik an navîn in û bi Vaxzevria® ya AstraZeneca piştî vaksînkirina duyemîn hinekî ji vaksînekirina yekim kêmtir derdikevin.

Gelo dibe ku vaksînekirinê bandor hebe?

Bndorên derziyê ji ber berteka derziyê ye ku ji bertekên normal zêdetir e, ku bi girîngî bandorê li rewşa tenduristiya kesê vaksîne kirî dike.

Vaxzevria® von AstraZeneca:

Ji destpêkirina vaksîneyê ve, di bûyerên pîr kêm de paş vaksîne kirina bi Vaxzevria® ji AstraZeneca® meyîna xwînê (tromboz) bi kêmbûna jimara plaketan (trombocîtopeniya) hatine dîtin. Di nav van de

hin bûyerên giran hene, di nav wan de lebatên xwînê yên li deverên cihêreng an jî ne asayî (tromboza sinusê reh a mejî an di valahiya zikê de wekî tromboza reha mesenter), digel vê yekê çalakiya meyîna xwînê an jî zêde bûna xwînêjiyê di laşî de. Piraniya ev bûyer di navbera heft û 14 roj piştî vaksîneyê û piranî li kesên di bin 60 salî de pêk tê. Hin bûyerên hatine şirove kirin mirin yan ziyanê mayinde bûn. **Vaksîna Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson:** Di babetên kêma de (0.01% heta 0.1%), bertekên zêde hestiyarî û urtîkarî çêbûne.

Ji dema destpêkirina vaksînê, bertekên alerjîk ên lezgîn (bertekên anafilaktîk) di rewşên pir kêma de hatine rapor kirin. Ev piştî vaksîne kirinê demek kurt rû diden û pêdivî bi dermankirina bijîşkî heye. Hemî ev vaksîne kirin, di rewşên pir kêma de derketina berteka alerjiya yekser, wekî şokê, an jî bandorên din ên berê yên nediyar, bi yeqîn nayên red kirin.

Di bûyera derketina nîşanên piştî vaksînekirinê de, ku ji bertekên normal ên demkî yên beşî û gelemperî zêdetir in, dê bijîjkê malbata we bi xwezayî ji bo şewirê berdet be. Di rewşa bandorên giran de, bi taybet bêntengî, êşa singî, werema pêyan yan êşa zikî ya berdewam, serêşa zêde yan domdar yan tevheviya dîtînê, an jî eger we çend rojan piştî vaksîneyê reşbûna qalikî yan xwînêjiya derveyî cihê derziyê heb, ji kerema xwe bilez ji bijîşkî bigerin.

Wekî din, hûn dikarin bixwe bandorên kêlekî ragihînin: <https://nebenwirkungen.bund.de>

Digel vê belgeya ragihandinê, pisporê vaksînê dê derfetê bide we ku hûn ji bo zelalkirinê bi wî re bipeyivin.

Nivîs:

Îmzeya pispor

Îmza kesa/ê ku vaksînê werdigire an jî eger kesa/ê ku vaksîne dibe ne şareze be

Ji bo razîbûnê:

Îmzeya nûnerê qanûnî

(Sergêr, Pêşkêşkerê Alîkariya Hiqûqî an Çavdêr)

Enstîtuya Paul Ehrlich (PEI) bi rêya sepana telefona hîşmenda SafeVac 2.0 rapirsiyekê li ser pejirandina vaksînê ji bo parastina li dijî vîrûsa korona ya nû (SARS-CoV-2) birêve dibe. Hûn dikarin di nava 48 saetan piştî vaksîneyê qeyd bikin. rapirsî dilxwazî ye.



Hûn dikarin li ser navnîşanên jêrîn bêtir agahdarî li ser vaksîna COVID-19 bibînin.

www.corona-schutzimpfung.de

www.infektionsschutz.de

www.rki.de/covid-19-impfen

www.pei.de/coronavirus

Çapa 1 Guhertoya 004 (ji roja 1-ê Nîsana 2021-an)

Ev belgeya ragehandinê j aliyê Deutsches Grünes Kreuz e.V, Marburg bi alîkariya Enistîtûya (Robert-Koch) Berlin, hatiye berhv kirin û mafê çapa vê parastîye. Tenê dikare di nav hedefa xwe de ji bo karanîna ne-bazirganî were belavkirin û veguheztin. Her guherandin an serastkirinek qedexe ye.

Sabiqeya bijîşkî ji bo vaksînekirina pêşîlêgirtinê li hemberê COVID-19-ê – bi vaksena hilgir

1 Ma we¹ niha nexweşiya giran bi tayê heye?

0 Erê

0 Na

2. Gelo hûn¹ niha li hember COVID-19 hatine vaksînekirin?

0 Erê

0 Na

Eger erê, kengî û kîjan vaksîne:

Roj:

Vaksîne:

(Ji kerema xwe di dema vaksînelêdanê de karta xweya vaksînelêdanê yan her belgeyek din a vaksînelêdanê bi xwe re bînin.)

3. Eger we¹ dozeya yekem a vaksîna COVID-19 standibe: Gelo we piştî wê bertekek alerjiya hebû?

0 Erê

0 Na

4. Gelo bêguman hatiye îspat kir ku hûn berê tûşî vîrûsa Korona (SARS-CoV-2) bûne? (Piştî tûşîbûna ji SARS-CoV-2, vaksîne ji 6 mehan zûtir piştî başbûn an pêhesînê tê pêşniyar kirin.)

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Erê ye, kengî?

5. Gel hûn¹ tûşî nexweşiyên kronîk ne yan we¹ kêmasiya parêzbendiyê-ê heye (ji bo nimûne ji ber kîmyadermanî, tepsîna pergala parêzbendiyê yan dermanên din)?

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Belê ye, çi cûreyek

6. Gelo we¹ kêşeya rawestana Xwînê heye an dermanê Rînker û zelalkera xwînê bi kar tînin?

0 Erê

0 Na

7. Gelo we¹ alerjiyeke (Hestiyarî) naskirî heye?

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Belê ye, çi cûreyek

8. Gelo we¹ piştî vaksînekirina cudaya pêşîn, nîşaneyên alerjîk, taya zêde, jixweçûn an bertekên din ên ne-asayî tecrûbe kiribûn?

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Belê ye, çi cûreyek

9. Ji bo jinên di temenê zarokbûnê de: Ma hûn niha ducanî ne yan jî şîrê xwe didin¹?

0 Erê

0 Na

10. Gelo hûn¹ di 14 rojên bihurî da hatine vaksînekirin? _____

0 Erê

0 Na

¹Nûnerê qanûnî jî dikare vê bersivê bide.

Razîname derbarê Vaksînekirina pêşîlêgirtinî li hemberî COVID-19-ê - bi vaksena hilgir – (Vaxzevria®, berê vaksîna AstraZeneca COVID-19 ya AstraZeneca û vaksîna Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson)

Navê kesê/kesa ku tê vaksînekirin (Paşnav, nav):

Rojbûn:

Navnîşan:

Eger kesa/ê ku vasîne dibe ne mafê radestkirina razînameyê tune ye, nûnerê qanûnî dê razîbûna vaksînekirinê yan nerazîbûna vaksînekirinê ragihîne. Di rewşek wusa de, ji kerema xwe nav û hûrgiliyên têkiliyê yên nûnerê hiqûqî jî bidin:

Nav, paşnav:

Hejmara têlefonê:

Email:

Ez li ser naveroka pelê agahdariyê hîn bûm û derfet çêbû ku ez bi pisporê xweya vaksînê re axavtinek berfireh bikim.

o Min pirsek din tune.

o Ez derheqê vaksînekirina pêşniyarî li hemberî COVID-19ê bi vaksena hilgir razî me

o Ez bi vaksînekirinê nerazî me

o Ez bi eşkere dev ji axaftina li ser zelaliya bijîşkî berdidim

Nivîs:

Cih, Roj:

Îmzeya kesa/êku vaksînê werdigire

Îmzeya pispor

An eger kesa/êku vaksînên dibe ne şareza be

Ji bo radestkirina razîbûnê bişînin:

Îmzeya nûnerê qanûnî (sergêr,

Pêşkêşkerê lênêrîna hiqûqî an lênêrînê

Ev forma sabiqeya bijîşkî û razîname ji aliyê Deutsches Grünes Kreuz e.V., Marburg bi alîkariya Enistîtûya (Robert-Koch) Berlin, hatiye berhv kirin û mafê çapa vê parastîye. Tenê dikare di nav hedefa xwe de ji bo karanîna ne-bazirganî were belavkirin û veguheztin. Her guherandin an serastkirinek qedexe ye.

Weşanger: Deutsches Grünes Kreuz e.V., Marburg

Bi hevkarîya Enstîtuya Robert Koch, Berlîn

Çapa 001 Guhertoya 002 (Roja 1-ê Nîsana 2021-an)